Pêşeroj yan paşeroj?

Zagrosê Hajo

Pirsa bikaranîna peyva pêşeroj yan paşeroj bo nîşankirina dema werê çend caran bi dîtinên cuda hate şirovekirin û du bend jî weke her car peydebûn, benda pêşerojê û benda paşerojê. Helbet her aliyê rêzimana zimanê kurdî dive were munaqeşekirin û lêkolîn li ser werine kirin. Bi tenê gerek e ew nebe weke i-ya bê xal û i-ya bi xal, ko gelek caran bi agumentên ne di cihê xwe de û nezanistî cih ji i-ya bê xal re di alfabêta kurdî de çêkririne, mijar dihate tevdan û gelekî bi wan argumentan hate dirêjkirin û cûtin, bi kurmanciya gewr pirs kelê bûbû.

Behweriya min ew e, ko dema du mirov li ser pirsekê bikevine qirika hevdû û ew xwedî zanînên hevbeş bin, em bibêjin weke nimûne eger ew di zanînên ziman de xwediyên zanistiyên akademî bin û ew xwe ji hînbûnên zanistî dûr nexin, ew kes dê dawiya dawî bi hev re bigehine çareyeke hevbeş. Dibe ko riyên ew bidine ser ne yek bin, lê çare dê di nava têgehiştinên zanstî yên heyama me de bin.

WÊNE1,Paşeroj

Di pirsa paşeroj û pêşerojê de jî gerek e, ew mirovên di warê zimên de xwedî hînbûnên bilind bin, xwedî têgehiştinên zanistî akademî bin, ew dê piştî lihevguhdarkirinê û pevguhastina dîtinan bigehine yek encamê: ka ji bo nîşankirina dema werê peyva paşeroj yan pêşeroj rast e. Ez hêvî dikim win şaş tênegehin, ez bi xwe di warê zanînên zimanî de nexwediyê wan pileyên akademî me. Ez dixwazim bi tenê ji aliyekî din ve li pirsê binerim.
Pirs bi xwe bi wext ve girêdayî ye. Wext jî di zanistiyên teknîkî de parametrekî fîziyayî yê herî giring e. Wext, ev parametrê gerdûnî fîziyayî xwedî wê xisletê ye, ko ew ji heyameke sermedî kevnare ve destpêdike, ew tê û di vê kêlîkê de ko win van pitikan dixwênin wext digehe vir, li vir e, dem jî dema niha ye, mand e û ew ber bi heyameke sermedî ya nû ve diçe, ew her û her ber bi aliyê werê ve diçe, ew bi pêş ve diçe, li gor zanînên heyama me ew ti caran berevajî naçe, ber bi paş ve naçe. Eger me li ser vê yekê li hev kir, hingî em dikarin li hev bikin jî ko pêşeroj nîşana dema werê ye.

WÊNE2, Pêşeroj

Ez şirova vê pirsê di van herdû wêneyên li ber dest we dibînim. Li wêneyê pêşî, wêne1 binerin. Eger siwarên erebeya mîtanî biaxivin, binerin, wan pişta xwe daye heyama ko wext bi berve diçe, tevlî ko bive neve ew mirov bi xwe û bi ereba xwe ve ber bi heyamên werin ve diçin; hingî, ji ber wê her bûyer, her qewimandina çûbe, derbasbûbe li pêşiya wan e. Dema ew dibêjin: pêşiyên me ev gotine, pêşiyên me ev kirine, li gor aliyê ko berê xwe danê de, ew rast

dibêjin, ew ber bi pêş ve diçin, lê di vê ajotina erebeyê ya xerîb de, li ber wan li pêşiya wan bûyer û qewimandinên berê ne, yên kevin in. Bûyer û qewimandinên nû werin li paş wan in, li gor vê di paşerojê de ne.

Niha li wêne2 binerin. Siwarên erebeya mîtanî weke ko gerek e erebeya xwe diajon. Berê mişana erebeya wan li heyama werê ye, erebeya wan ber bi pêş ve diçe. Wan jî berê xwe daye aliyê ko erebeya wan bi ber ve diçe. Ew bûyer û qewimanda çêbû û derbasbû li paşiya xwe dibînin, ew li pêşeroja fîziyayî gerdûnî dinerin. Her tiştê ko di dema werê de biqewime li pêş wan herû camêran e, ew dema werê pêşeroja wan e.
Ez bi xwe jî dibînim, ko pêşeroj rast e, ji ber ko di rewşeke adetî de gerek e, mirov pişta xwe bide heyamên buhûrtî, aliyê ko wext jê destpêkiriye û berê xwe bide heyamên werin, aliyê ko wext bi ber ve diçe.
Lê gelo çima di zimanê kurdî de ev tevlîhevî û alozî qewimiye? Dibe ko ev herdû bêje: paşeroj û pêşeroj ji van bêjeyên ko hin kes bi xwe çêdikin û belav dikin. Bêjeyên xweristî yên resen di hişê xelkê de bi gelemperî xwediyên wateyên naskirî ne. Ji ber vê yekê pêwistiya van bêjeyên nûçêkirî bi lihevatina zimanzanan û bi danasîneke diyar heye.

Hui Yang, Çînistan
7.9.2003